# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (253) | Îlon / 15-09-2023


# ENKS, bangên vêxistina fitneyê di navbera Ereb û Kurdan de şermezar dike

## Pêwîste vegereke ewle ji koçberên Efrînê re were dabînkirin



Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS 12ê Îlona 2023an di daxuyaniyekê de ragihand, ENKSê roja Yekşemê 9/10/2023 civîna xwe ya asayî lidar xist û tê de li ser rewşa siyasî ya Sûriyê bi giştî, aloziyên li Dêrazorê, xwepêşandanên li Siweyda û pêşhatên li Efrîn, SerêKaniyê û navçeyên din ên Kurdistana Sûriyê yên gotûbêj kirin.ENKSê derbarê alozî û bûyerên vê dawiyê li Dêrazorê derketine de ragihand, Ne HSD nûnertiya Kurdan dike, ne jî endamên hin eşîrên Ereb nûnertiya Ereban dikin. Herwiha bangên vêxistina fitneyê di navbera Ereb û Kurdan de şermezar kir. Di vê derbarê de ENKS, binpêkirinên li dijî her pêkhateyekê ji her aliyekî ve û hemû hewldanên guhertina dîmografî li her herêmekê ji xaka Sûriyê şermezar kirin û bang li hemû pêkhateyên Sûriyê kir ku aştiya sivîl û civakî biparêzin û çanda pêkvejiyanê di nav xwe de ava bikin. Li ser rewşa Siweyda, ENKSê piştevaniya xwe ji xwepêşandanên Siweyda û navçeyên din ragihand û got ku tevgera gel û daxwazên wan rewa ne. Derbarê rewşa Efrînê de, ENKSê tekez kir, "Biryara Wezareta Xezînedariya Emerîkayê ya sepandina sizayan li ser hin komên çekdar ên li Efrînê û hin serkirdeyên wan, gaveke rast e ji bo rêgirtina li binpêkirinên berdewam ên li Efrînê.

> «Pêwîste Civaka Navdewletî hewlên guhertina demografî rawestîne»

ENKSê di vê derbarê de jî, bang li civaka navdewletî kir ku berpirsiyariyên xwe ji bo rawestina van binpêkirin û hewildanên berdewam ên guhertina demografî, derxistina komên çekdar ji deverên niştecihbûyê, hêsankirina vegera bi ewle ya koçberan bo malên xwe, bicih bîne û rêveberiya Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî radestî xelkê wan ê resen bike. ENKSê di beşeke din a daxuyaniya xwe de, berdewamiya girtina endam û alîgirên ENKSê ji aliyê desthilata PYDê ve şermezar kir û daxwaza azadkirina wan û rawestandina binpêkirin û kiryarên ku dibin sedema koçberbûna xelkê kir. Herwiha tekezî li ser giringiya Bereya Aştî û Azadiyê û rola wê ya niştîmanperwer hate kirin.

> «Divê girtiyên li cem PYD werin berdan»

Di warê rêxistinî de, di civîna ENKS de endametiya Desteya Serokatiya ENKS di erkê xwe de hate nû kirin, û biryara berdewamiya pêkanîna ofîsan di civîna bê de hate dan.


Şoreşa Eylûlê şoreşeke seranserî bû — Rûpel—2

Raport.. Binpêkirinên grûpan li gundewarê Heleb û Serêkaniyê — Rûpel—3

Şeva tarî (Kurte Çîrok) — Rûpel—4

# Şoreşa Eylûlê şoreşeke seranserî bû

**Kurdistan**

Şoreşa mezina Eylûlê ya bi rêberiya Barzaniyê Nemir ku şoreşeke seranserî bû û çendîn destkeftên netewî û niştimanî ji bo gelê Kurdistanê pêk anîn, bi taybetî rêkeftina dîrokî ya 11ê Adarê, ku rejîma Be'sê neçar ma, hinek mafên netewî yên xelkê Kurdistanê qebûl bike.

> **Destkeftên niha ji encama Şoreşa Eylûlê ne**

Piştî ku Serokwezîrê wê demê yê Iraqê Ebdulkerîm Qasim, Partiya Demokrata Kurdistanê wek partiyeke eşkere û yasayî betal kir û ji sozên xwe yên li ser mafên Kurdan di çarçoveya Iraqê de vegeriya, Kurd bi neçarî dest bi xebata siyasî ya nepenî û xebata çekdarî kir, Şoreşa Îlonê bi rêberiya Mela Mistefa Barzanî di 11ê Îlona 1961ê de hat ragihandin. Xebata serdema Şoreşa Îlonê dijwar bû, cîhan du alî bû ji aliyê her du welatên zilhêz Amerîka û Sovyetê ve, lê belê şoreşa Kurdan şoreşeke mezin bû. Pir wext derbas nebû ku şoreş ji Xaneqînê gihişt heta Zaxo. Kurd



hemû ji bo qubanîdanê amade bû, roj bi roj baweriya xelkê bi Barzanî û şoreşê bihêztir dibû. Yekem berhema vê şoreşê ku di dîrokê de hatiye nivîsandin, rêkeftina 11ê Adara 1970ê bû, ku gotûbêjên sala 1991ê jî ligel desthilata Bexdayê, li ser bingeha wê rêkeftinê bû. Beriya destpêkirina şoreşê, Kurd dihatin çewisandin û ti mafekî wan ê netewî tunebû, mafê xwendina bi zimanê Kurdî tunebû. Nikaribûn şanazî bi nasnameya xwe bikin. Iraq ji qebûlkirina mafên ku di dema damezrandina sîstema komarî de pejirandibû, vegeriya. Rêkeftina Cezayîrê ya 6ê Adara 1975an, mezinbûna Şoreşa Îlonê derxist holê, ku desthilatdarên Iraqê bi tenê nedikariyan şoreşê têk bibin û dawîli xebata Kurd a ji bo gihiştina mafên xwe bînin. Niha Serok Mesûd Barzanî xebata bidestxistina armancên ku bavê wî Mela Mistefa Barzanî dabû destpêkirin, didomîne. Hemû şiyanên xwe ji bo gihiştina encama ezmûna Kurdistanê û pêşvebirina demokrasî û parastina pêkvejiyana olî û netewî û garantîkirina mafên Kurdan bi karî tîne, heta wê roja ku Kurdistan bigihîje serxwebûnê. Serok Barzanî bi boneya destpêkirina Şoreşa Eylûlê peyamek belav kir û ragihand: Şoreşa Îlonê şoreşa herî mezin a siyasî û çekdarî û civakî ya gelê Kurdistanê bû ji bo parastina nasname û berevanîkirina mafên rewa yên gelê Kurdistanê û berqerarkirina demokrasiyê li Iraqê.

> **Şoreşa Eylûlê ezmûneke bêhempa ya xebat û têkoşînê bû**

Şoreşa mezin a Îlonê bi rêberiya Barzaniyê Nemir ezmûneke bêhempa ya xebat û têkoşînê bû ku hemû navçeyên cuda cuda yên Kurdistanê û hemû çînên civakê û tevaya pêkhateyên olî û netewî yên Kurdistanê tê de beşdar bûn.

> **Di şoreşê de ji her çar perçeyên Kurdistanê beşdar bûn**

Di 62emîn salvegera destpêkirina Şoreşa Îlonê de pêzanînên min ji bo xebat û westana hemû şoreşger û Pêşmerge û kadroyên Şoreşa Îlonê heye, ku rola wan hebû di şoreşa mezin de û şanazî ji bo gelê xwe tomar kirin.

# Raport.. Binpêkirinên grûpan li gundewarê Heleb û Serêkaniyê

Kurdistan-Bidûvçûn

Komîteya Lêkolînê ya Serbixwe ya ser bi Netewên Yekgirtî di raporeke nû de dibêje, di 6 mehên destpêka îsal de, komên çekdar ên dijbereya Sûriyê gelek binpêkirin li gundewarê Helebê û Serê Kaniyê kirine, ku Kurdan bi tometên pêwendiyê di gel HSD û YPG digrin û êşkence dikin. Herwiha gotiye, berpirsên Tirkiyê jî, destê wan di êşkencekirina Kurdan de li wê navçeyê heye. Di raporeke nû de Komîteya Lêkolîna Serbixwe ya bi ser Netewên Yekgirtî ve dibêje, komên çekdar yên dijberiya Sûriyê li bakurê Sûriyê binpêkirinan di derheqê Kurdan de dikin û bi tometên cuda wan desteser û êşkence dikin. Rapora Komîteya Lêkolîna Serbixwe behsa bûyerên di navbera yekê Kanûna Duyem heta Hezîrana 2023an de dike, li gor raporê, komên çekdar ên dijberiya Sûriyê li gundewarê Heleb û Serê Kaniyê kiriyarên xirab, êşkencekirin û girtina bi zorê kirine û piraniya qurbaniyan jî Kurd in.
Herwiha belav kiriye, Kurdên têne girtin bi tometa peywendiya di gel Hêzên Sûriya Demokrat HSD û Yekîneyên Parastina Gel YPG têne girtin û di zindanan de rastî êşkenceyên xirab tên.


> Bûyera kuştina sê welatiyên Kurd li Cindirêsê dighe asta tawana şer

Komîte dibêje, ew di lêkolînên xwe de berdewam in derbarê bûyerên destrêjiya seksî û ji xeynî wê ji



awayên tundiyê ku çekdarên dijberiya Sûriyê kirine. Amaje bi wê yekî jî kiriye, ku berpirsên Tirkiyê jî destê wan di binpêkirinan de hene û efserên Tirk yên ku li wê navçeyê hatine erkdar kirin sivikatî bi girtiyên Kurd kirine û ew êşkence kirine. Herwiha derbarê bûyera Newrozê û kuştina sê welatiyên Kurd li Cindirêsê jî dibêje, dibe ew kuştin bigihe asta tawana şer.

# Jîna Emînî.. Sembola têkoşîna azadiya jinan



Hêvî Delî

Qamişlo

Şehîdkirina keça Kurd Jîna Emînî bû sembola têkoşîna azadiyê û rûmetê, herwiha bû nemûneyeke ber biçav a ji holê rakirina azadiya jinan û vêxistina çirûskên serhildanê li Kurdistana Îranê û li hemû cîhanê, bi şêwazên cuda li dever û bajar û bajarokên her çar parçeyên Kurdistanê xwepêşandan û nerazîbûnên xwe nîşan dan di bin dirûşma: "Jin, Jiyan, Azadî" bi van gotinan jina Kurd li Kurdistana îranê û li tevaya cîhanê silogan û diruşm bilindkirin û têde daxwaza mafê jinê kirin, herwiha rakirina zext û zordariya li ser jinê tê kirin nemûne" Jîna Emînî . Jîna Emînî, keça Kurd ya 22 salî, ku ji bajarê "Seqiz"yê Kurdistana Sûriyê bû, di 13ê Îlûna 2022an, bi malbata xwe re diçe Tehranê ji bo serlêdana xizmên xwe, û "Emînî" li stasyona Heqanî ya metroya Îranê  ji aliyê polîsê Exlaqê yê Tehranê ve, bi hinceta pabendnebûna bi hîcaba Îslamî hate binçavkirin û rastî êşkenceyê hat, û piştî 3ê rojan di 16ê Îlûnê de di nexweşxaneya Kesra ya Tehranê de jiyana xwe ji dest da, û bi hezaran kes li ser gora wê kombûn. Ji destpêka belavbûna nûçeya şehîdbûna keça Kurd "Jîna Emînî" li seranserî Kurdistana Sûriyê dest bi xwepêşandanan kirin û bi hezaran xelk li dijî kiryarên rejîma Îranê daketin qada û kolanan, û hêzên ewlehiyên Îranî bi şêweyekî hovane êrîşî xwepêşendaran kirin, û di encamê de bi sedan hatin binçavkirin û bi dehan

> Şehîdbûna Jîna Emînî li seranserî Kurdistan û cîhanê deng veda

kes jî birîndar û şehîd ketin, herwiha derbarê zilm û zordarî û binpêkirinên ku rayedarên Îranê derheqê gelê Kurd de




li Kurdistana Îranê de têne kirin li hemû welatên cîhanê xwepêşandan lidar xistin û têde ala Kurdistanê bilindkirin û nerazîbûn û şermezariya xwe danaxuyakirin, û hevxemiya xwe bi armanca piştevaniyê û piştgiriya serhildana gelê Îranê re diyarkirin, ku bi dehên salan rejîma Îranê û zordariyê li ser wan gelan dikirin û dikin û ji bo dilsoziyê bi malbatên pakrewanan re, bi pêşengiya "Jîna Emînî" ku bû dirûşma dengê azadî û berxwedanê, û êdî kesayetên siyasî, civakî û hunermend yên jin û ji hemû neteweyên cuda ji ber kuştina Jîna Emînî bi birîna porên xwe nerazîbûna xwe nîşan dan. Tê zanîn, li Îran û Rojhilatê Kurdistanê bi hezarê salane jin rastî zext û zordarî û îşkenceyê dihate kirin, ji bilî ku jin xwedî ezmuneke cuda ye, rola xwe di pêşxistina hişmendiya civaka Kurdî de hebû, lê rejîma Îranê her û her jinê weke xala herî lawaz didît di nava civakê de û binpêkirin û fişarên tund li dijî wî pêk tenî û bêparhiştina wan ji mafan. Lê di dîroka Rojhilatê Kurdistanê û Îranê de jinê bi vîneke bi hêz rûpeleke nû vekir li hember dijminên azadî û mirovahiyê de, û herwiha rola xwe di pêşengiya tevgera Kurdî de postên pêşketî girtine, taybet di vê qonaxa hestiyar de ku jin bûye hêmana bingehîn a avakirina civakê, û hebûna xwe di dîrokê de çesipand û serhildana têkoşîna mêrxasiyê berxwedaniyeke mezin nîşan da. Hêjaye were gotin, ji bilî jin xuşk û dayîk, ji ber ku jin perwerdekarin di avakirina mirovan de ew xwedî dîrokeke demdirêj in di qadên siyasî, leşkerî û civakî Kurdî de cih girtine.



Nûr Mardînî

# Şeva tarî

**Wergerandina ji Erebî: Mahir Hesen**

## Kurte Çîrok

**Şam**

Di yek ji malan de qêrînek bilind hat bihîstin, di destpêkê de bi rengek bêzelal, lê paşê diyar bû ku tiştek nefret, kuştinek hovane, qewimî. Ku Kesek hat kuştin, lê bêyî eşkerekirina nasnameya kiryaran, û bi her halî de, pêwîst bû ku li ser pirsê hûr bibe û hûrgiliyên tawanê eşkere bike. Mexdûr bi kêrê hatiye kuştin û xuya ye 20 saet di ser kuştinê re derbas nebûye, şopa tiliyên mexdûr li ser kêrê ye û derî neşikestiye, gelo em bi kuştinê re rû bi rû ne an bi xwekuştinê re ne? Nameyek ku me di bêrîka mexdûr de dîtiye heye û di nameyê de ev tişt hatin gotin:
"Hemûyan dev ji min qeriyan, zarokên min û hevjîna min jî, xwediyê kar jî ez ji kar derxistim û bi her awayî hewl da ku sira wî eşkere nebe. lê ez razî nebûm û ji ber ku peydakirina karekî nû hema hema ne mumkin bû, ji ber ez ne me xortim, ji ber ku ez temenê xwe yê zordar derbas kir û gihîştim temenê şêst salî, û êdî kes xem nake ka ez bijîm an Na, ez çima bimînim? Piştî ku te laşê min bibîne, ez dixwazim ku tu ji kurê min Romîyo yê deh salî re bibêjî ku min pir jê hez kir û ez hêvî dikim ku ew ê min efû bike.
Bavê te Robîn...

- Ezbenî, dixuye ku wî xwe kuştiye piştî ku hêviya xwe ji jiyanê winda kiriye.
- Lê gumana min ji vê yekê heye, eger wî ji hebûya bêhêviyê ye lê qed nayê wê wateyê ku zirarê bide xwe jî, ev ne behane û ne sedemek mezine ji bo xwekuştinê, mesele nezelal e, mexdûr çawa dikaribû ew qas nefsbiçûk be û bi tenê ji ber ku karê xwe winda kiriye xwe bikuje. Û piştî ku wî ew qas êş kişand?Lê rastî li ne diyar e, dibe ku sûcdar ev tişt xwestiye, wî xwestiye ku me bîne ser vê dîtinê. Belê, ez raman dikim ku tiştek heye dive em zanibin, hêj gelek gavên me hene ku em vê yekê teqese bikin ku wî xwe kuştiye û nehatiye kuştin.

- Em ji ku dest pê bikin, ezbenî, ji ber ku di vê gavê de ti arguman û delîl li ber destê me nînin?
- Pêşî divê em têbigihin ka dijminên mexdûr hene yan na
- Belê, ez ê lêkolîn bikim, ezbenî
- Ez li bendê me

Piştî du saet û nîvan, Detective Mark vegeriya ku ji Harry re li ser delîlên ku wî bi dest xistibû vebêje:
- Ezbenî, me dît ku dijminatiya wî heye, vê dawîyê bi jina wî Jacqueline re nakokî derket, cîranan ji me re gotin ku sedema wê ne kar e û pereyên wî têra lêçûnên rojane nake. . Ji ber sedemeke nediyar bi xwediyê kar xwe Jackson Lamer re jî dijminatiya wî hebû. Dibe ku - ya ku di nameyê de hatiye gotin hincet bû ji bo sûcê eşkerekirina sirê. Di van demên dawî de, bi cîranekî bi navê birêz Alex re xirecir derket. . Jê hezar dolar deyn girtiye û nedaye û wisa dixuye ku vê dawîyê ji bo qumarê xerc kiriye.
- Ev nîşan dide ku di serî de jina wî Jacqueline, rêvebirê karê wî birêz Jackson, û di dawiyê de cîranê wî Alex, ev dubendî tevlihev bûye, lê sedem hîn zelal nebûne, ji ber ku hemî axaftinên ku li ser wê hatine gotin ew in, Tenê devkîne, û ya ku tê veşartin sedem e.
- Ezbenî, me piştrast kir ku Jackson kiryarên neqanûnî dike û ew zilamek e ku bi reftarên xwe yên tund û gotinên xwe tirsê dixe dilê mirovan, erê, diyar e ji ber vê sedemê hatiye derxistin û Jacqueline xanim zewicî ye. duh, her çend ew hîn bi fermî ji hev veneqetiyane, wê hewl dida ku têkiliya xwe ya nû veşêre. bi hêviya ku ew bimire. An jî di zûtirîn dem de dev ji hev berdin.
Nizanim ew tawanek hêsan bû yan tevlihev bû, ji ber ku tawanbar sê kes in. Ez bawer nakim ku kesek kuştinê bike da ku pereyên ku wî deyn kiribûn vegerîne, nemaze ji ber ku me piştrast kir ku ew wê şevê li cihê tawanê nebû. Ew li daweta keça xwe de bû, ji ber vê yekê sûcê du kesan nîşan dide: an jina ku pir hêrs bû, an birêz Jackson. Jina wî dibêje ku ew li mala xwe bû û Jackson jî dibêje ku ew jî li mala xwe bû, lê em nikarin vê yekê teqese bikin. Pir zehmet e.
Yek ji cîranan diyar kir ku wî dengê qîrînê bihîst û paşê kesek derket derve û ji ber êvara tarî û dem dereng bû, wî nikarîbû bizane ew kî ye, lê roja din ew tawan qewimî û kes nehate mala Robîn.
- Ezbenî, di analîzê de tê gotin ku di xwîna birêz Robîn de jehrek hêdî heye ku piştî demekê encamê nîşan dide.
**-Tu çi dibêjî? gelo ev yek çawa ye? Çima wî jehr vexwar û paşê xwe bi kêran xwe kuşt!, tawan aloztir kir?**
- Birêz, hate tawanbar kirin ku birêz Jackson hatîye mala Robin, û hewil daye ku bi Robîn re guftûko bike da ku kar û barên xwe yên nefermî veşêre, lê wî bi eşkere red kir û postek ji polîsan re şand û ji wan re got ku ew kelûpelên qaçax bibkar tîne. Wî bi dizî ew jehrî kir û xwest ku perdeyekê li ser bêexlaqî, durûtî û nebaşiya niyeta kirinên wî bikişîne, diyar e ku Robîn gelek êş kişand ji ber ku bandor hêdî bû, lewma nameya xwe nivîsand û xwe kuşt..
- belê êdî em gihane rastiyekê. Tawanbar Jackson bînin û bila dadger rûniştinekê bike.

